EHMEDÊ XANÎ

DÎWAN

Zahidê xelwetnişîn, pabestê kirdarê xwe ye
Tacirê rihletguzîn derbendê dînarê xwe ye
Aşiqê dîlberhebîn, dildayê dildarê xwe ye
Vî zemanî, her kesek bê şubhe xemxwarê xwe ye

Bê 'emel tu j'kes meke hêvî 'eta û hîmmetê
Bê xerez nakêşitin qet kes ji kes zehmetê
Kes nehin hilgirit barê te bê ucretê
Gerçî Îsa bit ku wî fikra kir û bare xwe ye

Hoşiyar bî da nekî umrê xwe bêhasil, telef
Lew ku nakit fayîde mal û genc û ewlad xelef
Maceraya Xidir dîwarê yetîmî bû selef
Vî zemanî her kesek mî'marê dîwarê xwe ye

Ca nezer ke îbretê pêla ku waqi' bit suwaş
Ger nebîtin îltîfat û mewc û debr û meaş
Cindîyê rimbazê faris naditin canî belaş
Saeta serbazî hêvî ji serdarê xwe ye

Xaniya, zayi' meke weqtê xwe ey nadan, 'ebes
Bêteleb nabî ji weslê behremend, ey bulhewes
Sani'ê mutleq ku nîne îhtîyacek wî bi kes
Lutf û îhsana wî jî derheq telebkarê xwe ye

Ey ayîne, dil bi cemala te mucella
Wey sed sefhe bi yek zerre ji nûra te mutella

Însan te ji bo alemê kubra kire nusxe
Lew medfiyekê jê tu dikî 'erşê mu'ella

Wehdet bi heseb kusretê e'yan-i muzahir
Her sû di sifetan diketin keşif û tecella

Lew muxtelif'l-qewl û 'emel bûne xelaîq
Kafir ji senem bûne bi nave te tesella

Sirra xwe nihanî te ku da Ahmedê Xanî
Ez xeyrê berî şud be to awerd tewella

Mîrê meclis nekenit mutrubê goya çi bikit
Xunçe xendan nebitin, bilbilê şeyda çi bikit

Bîneka husnê butan lazim e sahib nezer
Kesê bîna ku nebit dîlberî zîba çi bikit

Kerem naçite tîpa edûwan merdê şecî'
Tîxê ahêxte bê destê twana çi bikit

Talibê ilm û kemalê nebitin qabilê feyz
Hîkmet û terbiyeta alimê dana çi bikit

Teb'ê Xanî sedefa gewherê 'irfan e welî
Metinxwanek nebitin sahibê me'na çi bikit

He dinalim şev û rojan, meger Eyyub im ez
Hêstiran her vedimalim, meger Ye'qûb im ez

Bi kerem dest ji me birîn gul û werdan yek in
W'er bipêçîn bi cefayê xwene mektûb im ez

Hindekî xem heye daîm li min ew vêk dikevin
Ez nizanim ku bi çavê wan qewî mehbûb im ez

Xem telebkarê me yîn, em xwe telebkarê di yar
We tilsimê telebê talib û metlûb im ez

'Eceb îqbalî ji min nehe Xanî ku li bal
Padîşahê xem û derdan wihe merx'ûb im ez

Ey dil! Ger te divêtin bibî daim mesrûr
Di terebxaneê dinya vexwe ava engûr

Pê nebe xeflet xewxayê cîhanê bidirrîn
Ji meqamê ku buhuştê ji sedayê tenbûr

Zemzema zemzemiya rahê Huseynî ji Hîcaz
Vexûnit Ka'beê dil nabite Beytu'l-ma'mûr

Perdeê zulmetê îşxalê cîhanê biderîn
Ji nezergaha cemalê tu hîcabê bike dûr

Menzer dîdeê canê te munewwer nebîtin
Nexlê "ma zax'e" nekêşî tu ji xal û xeta hûr

Gunehan ger nebûwa lezzet û zewqek haşa
Fa'ilê asim nedibû Tarik û taib mehcûr

Min guneh tê bi gunehan ku di nêv baxê cîhan
Semerê xoştir ev in bûn be heramî meşhûr

Hingî dewrê felekê saxirê me dûr diket
Meh û salan dikirit her we ji umrê me qusûr

Rabe ey saqîyê mehweş tu ji xema felekê
Bide min badeê le'lê tu ji cama fexfûr

Şêxê cam ez nefsê hemdem dil ket bi mirad
Li miradê dil murde dibîtin keşfê qubûr

Ye'nî ew xaneê gil nabite 'hail qet'a
Ne bi çeşmê dilê nazir ne bi rûyê menzûr

Şebê zulmanî îmkan dibit subhê numa
Afîtabê ehediyet ji feleq tête zuhûr

Işqebazî du terîq, çi heqîqet çi mecaz
Şem' ê can dê bisojîtin, çi bi nar û çi bi nûr

Ser û mal û dil û canê me fedayê te bîtin
Bike qelbê me tu saqî ji şeraba xwe tehûr

Da bikim kesbî meqamatê 'ulliwî derecat
Ya bikim keşfê keramat ji dara Mensûr

Zahida, ger te divêtin tu Xudayî nas bikî
Were ber sayeê şimşadê qedan qet meçe dûr

Bi zîyarî were qeydê şecerê Wadîyê Quds
Ger bizanî bibihey şîtê "enellah" ji Tûr

Ez lema şifteê walihê mehbûban im
Ku di nêv ayîneê cebhetê wan min dîye nûr

Her dema nedrikê xilxal binê her têne xurûş
Her dema turre ji ber tayê qeseb tête sudûr

Ya ku kagul ji kinarê kulahê keç biderîn
Ya xetê misk-i bi rêşî kit ji kenarê kafûr

Kafirê 'işq im eger ez nedimê îmanê
Ya bi mihrabê biruyan nebirim sejde ji dûr

Waiza guh bide min, da bebihêyî neqilê sehîh
Mishefa çehreê xûban e kitêba mistetûr

Deftera işq neda destê te mue'llim ji ezel
Maneya ayeta husnê li te lew ma mestûr

Bê tekelluf dixurim sondê bi Qur'ana şêrîn
Xaniya sûretê canan e bi min sûreê Nûr

Ey dil eger bi neqdê can, cinsê giranbuhayê zulf
Dê bikirrî bizan mecal, cewherê can fîdayê zulf

Xonçeê teng hewsele dil ji rikan/regan bikir tebî
Subuhgehan ku sur diket xilxeê hewayê zulf

Meşq diket simkutuban rûyê nîgar û husnê xet
Bendeê hezar û tifl dil hatine ber melayî zulf

Aşiqê bi ceger meger sebir ji can û dil diket
Mani' genc meqsed e heybeta ejdehayî zulf

Her serî mû bi sazekê, cilwe dikit bi nazekê
Aşiqê işqbazekê, bend diket belayê zulf

Rûm û Freng û Hindiyan, xal û nîşan û xemriyan
Xencer û şîr û tirkiyan, ceng e li ber lîwayê zulf

Tac û tumar û binperan, la'l û guhar û gewheran
Serxoş û dîn û ebteran, reqs e li ber humayê zulf

Law û ruwal û rîsipîyan, mîr û wezîr û cindiyan
Serxweş û mest û tebkiyan, derd e ji macerayê zulf

Şêx û murîd û salikan, şah û feqîr û malîkan
çust û çeleng û çapukan, dil kete bendê payê zulf

Ef'a û mar û ejder e, misk û zibad û enber e
Nefxeyê rûhperwer e, rayîheyê hewayê zulf

Bê mey û bê dewayekî, bê def û çeng û nayekî
Dîn diketin melayekî cezbeyê dilrubayê zulf

Mîr û mela û mahiran, çendî belîx [û] şairan
Xanî û hinde haziran, dade ji dest dewayê zulf

Ey derîxa mame tenha ez ji şemsê xawerê
Xan û man têk bûne zulmet paşî wê dêm xawerê
Paşî lêvêd wê venaxwim mutleq ava kewserê
Bêqerar im şibhê zîbeq bê ewê sîmenberê
Ger bizanim ez di heşrê dê nebînim dîlberê
Cennetê ez çi bikim ez pê wer bikim xagusterê

Sed mixabin çû ji ba min ew hebîba çav belek
Ah û fîxanim şev û rojan diçin hetta felek
Wê ji feryadê di min aciz bûyîn îns û melek
Mam di qeyda dax û derdan paşî wan zulfê helek
Ger bizanim ez di heşrê dê nebînim dîlberê
Cennetê pê çi bikem ez pê werbikim xagusterê

Hîcreta yarê bihar tim şibhê finda şû'ledar
Ketme halê îhtîraqê ji îftîraqê bûme nar
Ez wucûdê bê wucûd im sotî têk da bû xubar
Min nevê dinya bi carek paşî wan çavêt xumar
Ger bizanim ez di heşrê de nebînim dîlberê
Cennetê ez çi bikem ez pê werbikim xagusterê

Ger di hîna ez wefa bim bête ser min Ezraîl
Mujdeya Xuldê di wê gavê bidet min Cebraîl
Xidir ferxê pê ji min ra bit di wê rê da delîl
Dê bibêjim:ªMin nevêtin Xuld û Kewser, Selsebîl.ª
Ger bizanim ez di heşrê dê nebînim dîlberê
Cennetê ez çi bikem ez pê werbikim xagusterê

çerxê kec reftare û ew bala ku ez heyran kirim
Serfîraz bûm ez welêkin zêde sergerdan kirim
Bê dil û bê eqil û bê huş û bê îz'an kirim
Paş ku wê bêmurwetê ev renge ez talan kirim
Ger bizanim ez di heşrê dê nebînim dîlberê
Cennetê ez çi bikem ez pê werbikim xagusterê

Zînhar ey dostan! Weqtê bikim ez hîcretê
Van du misraan kîtabet kin li berg? kaxetê
Da di dest min da sened bîtin di beyta hesretê
'Erzî hala min ev mezmûn di hîna hezretê

Ger bizanim ez di heşrê dê nebînim dîlberê
Cennetê ez çi bikem ez pê werbikim xagusterê

Xanîya ev herzegoyî w xeta û nasewab
çend ji te sadir bibin ey bêedeb ey malxerab
Ev qezaya Barî ye razî bibe ey bêhîcab
Belkû bêtî mucibê narî ji bo te ev cewab
Ger bizanim ez di heşrê da nebînim dîlberê
Cennetê ez çi bikem ez pê werbikim xagusterê

Ey wahidê penahan ku ji zatê te ne peyda
Ev kewn û erz û sema, kumbeda xudra
Erwah û uqûl û infus û e'raz û cewahir
Halên di musewwer ne muhel û ne heyûla
Lewh û qelem û kursî yû erş û encum û eflak
Hem agir û ax, av û hewa cumle eşya
Sed qafîle mewcûd piyayî û mutewettur
Her lehze ji sehrayê edem tên bi temenna
Hin neqdê fenayê diguhêrin bi beqayê
Hin neqdê wucûda xwe dikin bêbedel efna
Her yek bi wucûda xwe wucûda te dixwazit
Bîl cumle xerîdarê cemala te ne heqqa
Lew şubhetê pîra bulhewes talibê Yûsuf
Dor hatiye Xanî gulxarî di dest da
Ew jî bi metaê xwe qumaşê te dixwazît
(Subhaneke len teyes mîn ruhîke 'ebden)
Ahmed ji senaya te nedaket qet çu wesfan
(Me'ecezni hemdek inne Ahmede hemda)

Ji le'lê di yarê emin mey vexwara
Bi dil min dibexşî Bedexşan û Buxara

Mudamî di destê xeman da zebûn im
Mudamî dixwim mey bikim da ez mudara

Dema ku kirime uzra ewî gul'îzarê
Dibin bê tekelluf dilê min 'uzara

Hinarin ji bo min der axûşê perwer
Hinarin di taze hebîba dilara

Ne yara te îro nezer da te Xanî
Neyaran nema ne rahet ne yara.

Mi dî neqşek ji neqşê neqşibendan
Vebû bendê di min yek yek ji bendan

Guşada dil ji bo min ra muyesser
Nebû bê suhbeta sûret lewendan

Ji ahûyan me yahû xwestî emma
Dilê min ma di nêv mişkên kemendan

Ez îro serxweş im wellah waiz
Li min zayi' meke wan we'z û pendan

Li min kurt bû riya ke'ba wîsalê
Ji şiklê qameta bala bilindan

Min sed hêvî heye dîsa ji seyyad
Mi aza ke ji qufl û qeyd û bendan

Kuşada dil dibû ma ra muyesser
Dilê min ma digel mişkê kemendan

Kesê giryan bîtin pêlek bi işqê
Dibîtin 'aqîbet elbette xendan

Dilê Xanî eger çî bû sincexane
Şukur qet kesî nego ªXanî bi çendan?

Seydê çingala serê zulfa şeha şehbaz im ez
Mestê cama işweya şehnazî nazik naz im ez

Remz û i'cazê di xûban bê îbadet seh dikim
Murşîdê kamil ez im îrohe sahib raz im ez

Beydeya ez tê 'ebes bû aşîyana min qefes
Gerçî dil pir hewes bû bê per û perwaz im ez

Vê heyata îbretê çi bikem beqa nînin ji bo
Lew şehîdê xemzeya wê dîlbera ten naz im ez

Derdmendek min divêtin hemnefes bit Xanîya
Ku me hemdestek hebîtin sazê xweş awaz im ez.

Ez çûme derê meykedeê sibheyek zû, min dîtî yeke esmer

Qamet bi mîslê dareî şimşadê, du gêsû manendê du ejder

Mahê mutereqqîb meykedeê û mezherê î'caz carek bi du sed naz

Halê me tefehhus bike bêje ku "feqîro ez bo te me xemxwar"

çin çin dimeşin bisk-i li ser gulşenê ruxsar manendê du şehmar

Geh geh dixuşin zulf-i li ser qewsê du ebrû manendê du şehper

Min gote ªdi weqtê seherê ew çi te da min ey serwîqeda min?´

Go ªma tu nizanî çi ye min da te feqîro? E'teytûke Kewser!´

Heta wekî lewhê sedef û xameê yaqût nezerêk bi Lahût

Min seyr kirîn sîdreten û tûba qed û dil çû nînin çu beraber

Hingî melek û hor û perî bêne temaşa haşa summe haşa

Kengê dibin ew laiqê nezarreê ebrû! Ey dil, meke bawer

Yar? ji derê meykedeê min meke bêpar ey seyyidê muxtar

Saqî ku tu yî eşhedû bîllahî di îro Xanî bûye meyxwer

Dilo carek xwe hişyar ke
Hilo da çin bi seyranê
Bi carek bes xwe bêpar ke
Were seyra gulîstanê

Gulîstana bi sorgul tê
Semen nisrîn û sunbul tê
Hezar-bilbil bi xulxul tê
Di hîva mahê nîsanê

Di fesla çardehê Nîsan
me dîbû dîlberek dîsan
Di dil meşe'l çira îsan
Me can da şubhê perwanê

Me dil da dîlberek sade
letîf û şêx û begzade
ji qeydan kir'me azade
nihanî bir'me dîwanê

Nihanî xelwetek da min
Ji le'lan şerbetek da min
Bi weslê suhbetek da min
Kirim bende di fermanê

Di fermanê ku hazir bit
Ê naxwaze munafiq bit
Divê her dem muwafiq bit
wekî Şêxê di Sen 'anê

Wekî şêxê di hazir bit
Li fermanê ku nazir bit
bi emrê dostê kafir bit
bisojit suhfê Qur'anê

Disojim suhfê mektûbê
Bi emrê yar û mehbûbê
Dema dil dim bi metlûbê
Didim ez dîn û îmanê

Eger dîlber mecazî bit
Ji rengê lebsê xazî bit
bila sofî nerazî bit
Bimînîew di hîrmanê

Binê, sofî qewî dîn e
Wekî xeffaşê miskîn e
Li nik wî roj, çu reng nîne
Xwe nebîne ji emyanê

Dilê wî kor e e'ma ye
Ji weslê dûr-i da maye
Li ber wî derge dadaye
Nehîşte bête dîwanê

Di dîwana ku qerqef tê
Di nêv bezma ney û def tê
Melaîk sed hezar sef tê
Ez im ê heta meydanê

Ez im serxweş li wê camê
Ez im sewda di nêv amê
Ez im enqa ketim damê
Bi zulfa ser xalan danê

Bi zulfa hate ser xalan
Binefşa tîtek û alan
Dil û canê me ebdalan
Dibir dîsa bi talanê

Di talana ku serxweş çûn
Hezar genc û we gewher çûn
Dilê sed pare, ker ker çûn
Tu Xanî bes ke efxanê

Fate umrî fî hewake ya hebîbî kulle hal
Ah û nalem hem demem şud der fîreqet mah û sal
Ger benim qanim dîlersen çoqdan olmuşdur helal
Dîn û ebter bûm ji işqê, min nema aql û kemal

Ente fikrî fî fuadî, ente rûhî fî cesed
Leşkerê xemhayê to mulkê dilem wêranî kerd
Dade geldim işq elinden îsterim senden meded
Wan Tetaran birne yaxme aql û dîn û milk û mal

Tale hemmî zade xemmî şae sirrî fîl mela
Teşneê camî wîsalem çun şehîdî Kerbela
Yoqsa sen dîwane oldun, nîce halin ey dîla
Yan ji nû ve îşweyek da min hebîba çavxezal

Bittûhicranen hebîbî lestî minnî alîmen
Her dem ez derdê firaqet, xafilî ez helî men
Can û dilden arz-i qildim halimî canane ben
Erzihala min tu xafil, qet napirsî erzê hal

Hel-lena min nî'metî weslil-hebîbî minnesîb?
Ufîtadem ber deret, bîçare, sergerdan, xerîb
Derdimiz çoq, lêkî senden ona yok hiç bir tebîb
Ey tebîbê min, dewaê derdê Xanî her wîsal

Ez çûme baxê sorgulan
weqtê sehergahê bi xef
Min dî sedaya bilbilan
dagirtibû her çar teref

Sewta hezar û qumriyan
dengê ribbab û muxniyan
teşbîhê bezma bengiyan
hevdeng bûne çeng û def

Manendê mest û serxweşan
ez çûme bezma mehweşan
Ebrûkevan û çavreşan
cerg û dilê min kir hedef

Peykan û cerg û dil perî,
Ten bûye sindoqa berî
Sindoq ji husnê ey perî
hêja li min bû kerb û gef

Hêja li min bû kerb û kîn
Zahir xezeb, batin kenîn
Lê xemzeyek da min nehîn
Aqlê me dîsan kir telef

Dîsa hebîba çavbelek
Îhsan digel min bû gellek
Lewra digel zulfên helek
Alûz me tînin qişt û lef

Şetrî û qişt û zulf û xal
hem'yan li ser ruxsarê al
vêkra hebûn ceng û cîdal
lêk aliyan bûn sef bi sef

Sef sef me dî vêk ra bi ceng
hindek Hebeş, hindek Fireng
Têk rabirandin wek xedeng
vêk ra hebûn wan laf û lef

Têkra191 hebûn dawa û şer
Der bûn li min tîpa Teter
vêkra kirin qelb û ceger
rêhtin ji dil xwîna bikef

Rêhtin gellek xwîna dilan
şehmarê zulfa ser milan
bêrehm û mestê qatilan
meyxwerê fîncana sedef

Wan meyxuran ebter kirim
Bêqût û bêenter kirim
Welleh ji dil ker ker kirim
Xanî bes e ah û esef

Neqqaşê ezel roja serlewheê rengîn da
Pergar'î ji destan bû, sersefhê tezyîn da

Tezhîb û zerefşan da serlewhê kitêba işq
Resma ezelî kêşa, neqşê xwe nû anîn da

Dîbace ku înşa kir, fîhriste ku îmla kir
Cildek ji enasir bit, nefxek bi sifalîn da

Etfal û melek hatin, westane di bustanî
[a]La ilme lena´ gotin, ebced bi xwe telqîn da

Wan saderûxan, meşqê işqê ku temenna kir
Xettatî ji husnilxett sermeşqekî zêrîn da

Ez çûme derê dêrê min dît ku Rûhullah
Têk da di mussewer bûn, hetta vinnîhalîn da

Wan cumle [a]en'el-Heq´ got, min [a]Wahidê Mutleq´ got
Saqî bi xwe ez girtim camek meyê noşîn da

Min noşî û serxweş bûm, fîlhal-i muşewweş bûm
Ez çar û neh û şeş bûm, min tekya bi balîn da

Şahid bibî, ey Xanî, mehbûbê perestar im
[a]Ha´ nuqte li bin danî, lew mame di nefrîn da

Ma secde tenê min bir ber sûretê mehbûban
Îblîsî nebir secde, lew maye di nefrîn da

Herçî ku me bîr pê kir hingî min nezer lê kir
Seyrek min li Leylê kir lewra min dil û dîn da

Min dî hîveke pertewsa ye di me zahir da
Mimkin hemî pertew da em mane di temkîn da

Ew bû ku Zuleyxayê wê dîtî di Yûsuf da
Mecnûnî di Leylayê, Ferhadî di Şêrîn da

Mîsbahê ebed min dî îro ve di qendîlê
Genca ezelî bû ew, min dî di gil û tîn da

Cana j'cemala te wan dî der sûretê xûban
Şeyx û welî û sofî der zikrê xwe ahîn da

Mefrûrî bî ger sofî, mebe munkirê xûban
Ger dê çi tessewur kî sirra ku di dewrîn da?

Şahid tu ey zahidê mehbûbperest im ez
Bê şahidî hemî nabim şeyxê me ev ayîn da

Canê ji te ey Xanî çana ku bixwazitin
"H"'a nuqte li bin danî, fîlhalî di mizgîn da

Min dî şeva cum'eê esmerek, ez bûm xulam
çûm tewafa rê û laman, dîlbera şîrînhudam
Şewq û nûra xet û xalan, dil muferreh bû temam
Esmarê min dîlberê min li te bin y¸z bîn selam

Sed selam û selawatê Padîşahê qudretê
Ew bibarin her mudamet bejn û bala qametê
Bê hebîba xwe me nevê qet duxûla cennetê
Esmerê min, dîlberê min, li te bin y¸z bîn selam

Ez feqîrek bênesîb im, nûrê Zatê Zulcelal
Herdu ebruyê hîlal in li cebînê bûne xal
Ez merîzek bêdewa me, hatime nik erzê hal
Esmerê min, dîlberê min , l te bin y¸z bîn selam

Leb eqîq û durr û mercan, ew ji eslê madenê
Qemer û şemsêd di burcan, rohniya wan da tenê
Sen'et û karê Xwedê ne, xal û nîşan ketinê
Esmerê min dîlberê min, li te bin y¸z bîn selam

Ey dilo rabe xwe pêk bîne, mecala bêt buhar
Bax û bostanê me xweş bû nêrgiza mestî xumar
Gul gul û çîçek û alal bi xwe bûne çar bi çar
Esmerê min dîlberê min, li te bin y¸z bîn selam

Gul gul û çîçek û alal, ew ji rengê te geş in
sinbil û rihan û sorgul, ew ji bêhna te xweş in
Misk û enber û bixûr e, em ji bêhnan serxweş in
Esmerê min dîlberê min, li te bin y¸z bîn selam

Sed selam û selewatê Padîşahê abidan
Ew bibarin her mudamet li Medîna Ehmedan
Rewzaya sîma mubarek hem li ser wan merqedan
Esmerê min dîlberê min, li te bin y¸z bîn selam

[Her wa me] bi zerzeng û hezar îşwe û meş hat
[...asit] kirin îhya li reqîban ku nexweş hat

Sunbul kemilandin gul û lale xemilandin
[Reyhan] şitilandin li rûxan taze binefş hat

...der venebû qet nedida bextê kuşadek
...ru da me şukur kabê taliê me duşeş hat

..peyda Firengan û Nîl û hatine Rûmî
Şukur [nehate] ji Ereb hem ji Hebeş hat

Reş tox xwe nubare meger goşe di xwar in
Tîra ku şeh date hedef girt û bi kêş hat

Yan hat û bi nîva dil ket û qet venewesta
Lewra ji ber qewsê me di zêde bi weş hat

Xanî bese bêar çira zêde salan Îsale ji
xwe tali' û bext ne bi reş hat

Dîsan dilê şeyda ji nû bê îxtiyarî perwaz kir
Seydek diye û berdaye du mil û firra şehbaz kir

Meyla wî mehza hîkmet e, seyda wî enqa sîret e
Teyrê wî bala hîmmet e lewra teleb evraz kir

Enqa bi dest kes nakevit damek divê ew dakevit
Nabit ku xafil rakevit, ê qesda seyda baz kir

Seyadiya min bû ebes, daim li min teng bû qefes
Rahet nebûm ez yek nefes, min lew efxan saz kir

[Saz û] semaya suhbetê, govend û çerxa dawetê
[Fikrîme] şikl û qametê, bîr têye min bi awaz kir

[Şiklê !] mecazî çend dike, seyda heqîqî wer dike
Teyxûnê qeydan lê veke biherî me behr endaz kir

Nêçîr dibê teyxûn bitin, çenge lipêş perxûn bitin
Şunqar nedî mecnûn bîtin, iskûv ji çavan baz kir

Şinqarê çav teyxûn e dil, berdane du çavêt bi kil
Xanî ewan gêrra xecel, lewra mecaz axaz kir

Hêdî li îbrîşim bide ey mutrubê demsaz
Sed dil bo vîn beste her yek bi dused naz

Ey badê saba pirr mehejîn turrrê dildar
Uşşaq binalîne ji merxule û şehnaz

Saqî bigerîn badeê engûr bi tenbûr
Cana bide min bûseyekê her we bi dilxwaz

Rûha min û sirra di rexê yar bi yek ra
Roja ezelî bûne bi dil hemdem û hemraz

Xelaqî teedded bi me zahir kire î'caz
Xanî te xelet zaniye ew her ji xwe yek bûn

Îro li textê dîlberê ya Reb çi şêrîn esmer e
Jê nabitin min dîlberê er dîlbere ya dîlberê

Dil goriya canan e ev, dîn bû û hem îman e ev
Hem îhsan e ev, hem law û hem gerdenzer e

Kakul ji ber tacê bi zer ta ta wekî pir tête der
Sereskerê tîpa Teter, serdar e yane serwer e

Zulf in gelo pir pêç û xem, ya sunbula baxê Îrem
Zincîreya ser ta qedem reşemar e yane ejder e

Ya Reb hebîba reng feleq ewrê teteq dagirt şefeq
Ya belkî nedrik ya wereq ya qişt e yan çenber e

Ew turr e yan gêsû ne ew, Zengî ne yan Hindû ne ev
Şitrî ne ya şihbû ne ew, ya tûxê Şahê Sencer e

Ebrû ne ya cotek hîlal, Hindû ne ya nîşan û xal
Gêsû ne ya hezret Bîlal meşxûlê Ellah ekber e

çav in gelo ya serxweş in, ya kafir in ya dilreş in
Bîmar in ew ya nexweş în ya nêrgiz û yan enber e

Ruxsar e ya Reb ya qemer, guftar e ya Reb ya guher
Ew qend e ya Reb ya xeber, ew şehd e yane şekir e

Ew rû ne yan gulberkê al, alal e yan dêma bi xal
Qendîla nûra Zulcelal mîr'at e yane mezher e

Dêm şûşe nûra heq di nav, dev xonçeya şêrîn gulav
Rûx sorgula rengîn xunav xal mişk e nîşan enber e

Ya Reb kitêba husnê yar, haşî ne yan xettê xubar
Yan ka'be hacî çarkenar, wan qesd hecul ekber e

Lêv in gelo yaqûtê can, yaqût e yan eqîqê Rewan
Yan qutiya dirca durran ya hewzava kewser e

Ya Reb xetê reyhanî ye, sersûreê Qur'anî ye
Yan xatema sultanî ye, mîr'at e e yan menzer e

Xal in gelo yan qelef în ew ariz in yan sorgul in
Em aşiq in yan bulbul in zikrê me werda ehmer e

Ew gerdena şubhê şemal, serçeşmeya ava zelal
Qarûreya xemra helal, yan şîşe ye yan şekir e

Ya Reb qeda zîba ye ev, yan ka'beya ulya ye ev
Yan Mescîdul Eqsa ye ev yan sidr e yane serwer e

Ya Reb dilê dîwane ye yan alimê ferzane ye
Yan bulbulê wêrane ye yan ûd e yan mecmer e

Ew Xaniyê dildade ye meşreb ji rengê bade ye
Derdê wî yarek sade ye lew her zeîf û rengzer e.

Ey dilê qelb nahejî yek ser mû ji tayê zulf
Ger nehejî tu pêlekê şubhetê min li bayê zulf

Xûn û dil û ceger dixun nafefiroşî her seher
Badê seba ku têk bidet sunbulê mişksayê zulf

Xonçeê tenik hewsele dil ji rikan bikir dibit
Subhegahan ku she dikit li xilxeê hewayê zulf

Meşqê dikin dêmkitêban ruyê nîgar e husnê xet
Hinde hezarî tifl, dil hatiye ber melayê zulf

Aşiqê bê ciger meger sebir ji can û dil diket
Maniîê li gencê meqsed e heybeta ejdehayî zulf

Talibê nûra xeyb im ez, mame di qeyd û zulmetê
Hêvî Xweda û himmeta hazirê ewliyayê zulf

Behr e cemala yar eger keştî tê seyr ger bikit
Destê min û te'elluq da min ta Xudayî zulf

Taliê bext ger meded dewlet seramedê me dî
Dil ku xwe daye ber siha çeng û perê hewaye zulf

Xanî jar û bê newa lê dicivin wiha sîtem cefa
Lew derçû ji dergeha sebr û seha newayê zulf

Durdane ji dev da me dibarin dem û satan
Kes nine bibit wan bigerîn di welatan

Sewdakirrê eşqê biriyan cumle dirêtin
Quta' û sealik û zemane fitratan

Qet ku her yek cewherek nîne buha ket
Bazara cîhanê mane bi wan turkmen û talan

Ebdê zeheb in hinde ku hin abidê fidde
Aşiqê derya meyê ne, di îd û erefatan

Meíşûq cemedat û aşiq bi xwe heywan
Însan biryan e ez çi xeyrê dem ji nebatan

Kuffarî bi dem daye hesarî me û xundkar
Hêja li şikarî digirîtin li felatan

Îslam li cengê tu mebê bo çi zebûn e
Lew ra ku kerem nîne li hematan û kematan

Rû daye îmarat û milûkane bi îsraf
Mîrî pisiyan Nadine xelqê xwe xelatan

Mîrê di Mehmedan xwe dubendî ne û xayîn
Îsayî ne, li Mûsayî dixûnin selewatan

Xelqê Hekkarî we dibîtin ku ji bo Şah
Hîna seferan ew dişehînin edewatan

Mîrêmîran wê dimirîtin ji feqîrî
Şêrwan û Muks bûyine muhtacê zekatan

Ya Reb di vê esrê biparêz Qizilbaş
Tuxyan û xurûcî nekin ew bêne welatan

Kî dê li vê Serhedê ji pêş wan veweste
Kes nîne ku têr nanî bidete van pênce xuzatan

Ya Reb bi duayê nebî û weliyan kî
Bi Încîl û Zebûr û Furqan û Tewratan

Ya Reb bi Mekkê kî Medînê bi tewwaf
Ya Reb bi heqê se'y û tewafa Erefatan

Ya Reb bi lewh û qelem û kursî û erşan
Ya Reb bi milk û melekût û semawatan

Ya Reb bi tewhîd û bi tesbîh û bi zikran
Ya Reb bi dua û selat selewatan

çende rîcalan her bişehîne tu ji xeybê
Îsalê sifrekêş bide xelqê xilûwatan

Xundkarî li kufarî muzeffer bike dîsan
Da Şah ji tirsan li emir det selewatan

Pamal zelalî nebîtin hewzeê Îslam
Qet layiq e ey xaliqê nûr û zulûmatan

Naqûs û selîbê di Frengan çi rewa ye ew bên
Bigirin cumle cihê bang û selewatan

Murted bibin ew cumle bimînin di grîftar
Terka me biden ew biperestin bit û latan

Ew çende tefasîr mesahîf bi telef bin
Hurmet çu nema ayat û hurûf û kelîmatan

Hindî ku dikit Xanîyê bêçare gunahan
Ya Reb tu bedel wan binivîse hesenatan.

Medihnama Ahmedê Xanî
derheqê hakimê Bayezîdê Mehemed Beg

Kanî Mehemed Beg gelo kan padîşahê Serhedan
Îro ji dil bigrîn de lo kan padîşahê Serhedan

Îro bibînin îbretê axa û xelqê Hişetê
Kanî xudanê xîretê kan padîşahê Serhedan

Mîrê di nêv mîran bi nav eşheb siwarê rimzirav
Bala bilindê pir belav kan padîşahê Serhedan

Kê dî we reng zatek şerîf erkan û ezmanek letîf
Alem di dest wî bû zeîf kan padîşahê Serhedan

Koma di mil bû sî hezar sed mîrekan vêkra ducar
Jêkrakirin ker û tar û mar [kan padîşahê Serhedan]

Senceq ji ser Qersê birî Bedlîsiyan Wan jêkirî
Xanî di mil kiribû çirî kan padîşahê Serhedan

Kanî ezîzê mîriyan, kanî edûwê Waniyan
Kan hevrikê Mehmûdiyan kan padîşahê Serhedan

Kanî emîrê namîdar, Serhednişînê Xundkar
Paşan ji bo pêşkêş hinar kan padîşahê Serhedan

Kanî emîrê zûfunûn kan aqilê tebîet cinûn
Alem li ber wî bû zebûn kan padîşahê Serhedan

Di ilmê xwe ew ellame bû, Behramê gulgûn came bû
Qîtalê pir hingame bû kan padîşahê Serhedan

çend mîr û hakim rakirin, çand xan û sultan dakirin
Kom û heşîm berba kirin kan padîşahê Serhedan

Ew hakimê pirr nav û deng hemtebîetê Têmûrê Leng
De'wa dikir "biçime Fireng" kan padîşahê Serhedan

Pêla ku wî dîwan digirt, xelqê edeb erkan digirt
Heybet ji wan dîwan digirt kan padîşahê Serhedan

Weqtê bi ser hespê diket şeş caniban rev pê diket
Heybet bi ser xelqê diket kan padîşahê Serhedan

Daîm edalet pîşe bû xayet deqîq endîşe bû
Nazik tebîet şîşe bû kan padîşahê Serhedan

Dîwan û edl û dadgîr îz'anpirr rewşen demîr
Hetta xoşîn nakin ji bîr, kan padîşahê Serhedan

Dîwan û eywan şaneşîn ew sedr û hewzêd nazenîn
Man şubhê Fîrdewsa berbîn kan padîşahê Serhedan

Ferşê di dîba û herîr îstebreqên wî bê nezîr
Bêîxtîyar mayîn ji mîr kan padîşahê Serhedan

Ev xaliyêt ermûş û qez wernagirît kes şubhê xez
Xalî bûyin meydan û rez kan padîşahê Serhedan

Rez bû mîsala cinnetê eywan ji sen'a qudretê
Kes nine têkit suhbetê kan padîşahê Serhedan

Elmas û leíl û gewheran, tomar û tac û binperan
Hed nîne bêxme defteran kan padîşahê Serhedan

Sed me'ne ku hespêd bedew, safî hudûd zêrên celew
Kes nîne wan raket ji xew kan padîşahê Serhedan

Ew şehnişîn û hewzê av nêçîrgehêd pirr seyd û rav
Nabit bibêjim ez bi nav kan padîşahê Serhedan

Şahînşehê gerdenfîraz aza kirin teyxûn û qaz
Terxan kirin teyhûn û baz kan padîşahê Serhedan

Mîrê me wê nabit siwar têr bûye ew naçit şikar
Teyxûn û terlan man li xwar kan padîşahê Serhedan

Serdariya koma gellek nakit siwarê çavbelek
çavêt sipî bûn ey felek kan padîşahê Serhedan

Taq û rewaq û menzeran koşk û kelat û xeyberan
Wan cumle nîşan Heyderan kan padîşahê Serhedan

Ew cumle wî îcad kirin her çend qewî bunyad kirin
çerxa hejand berba kirin kan padîşahê Serhedan

Xewahê kelata bi zefer dijmin ji ber wî bê mefer
Wê çûye nîva ax û ber kan padîşahê Serhedan

Dinya diborîtin bi dor umrê ezîz nadin bi zor
Dewlet dibên naçîte gorr kan padîşahê Serhedan

Ya Reb hebît ocax qedîm xemê di wî xweşbîn emîm
Xusûsen ew durra yetîm, kan padîşahê Serhedan

Durdaneê gewher sedef ew ma ji wî neslê xelef
Ya Reb nekî wan zû telef kan padîşahê Serhedan

Xelqê xudanê dewletê wê çûye mala zulmetê
Bo ra bixûnin rehmetê kan padîşahê Serhedan

Xanî tu jî destan hilîn her çend ku zêde dilkulîn
Îro bo mîr sail în, kan padîşahê Serhedan

Îşweyek da me seherê periya horî sirişt
Şeveqa birqî cemala dil û can soht û birişt

Min nezanî ku melek yan ne beşer bû
Yedê beyda wekû Mûsayî li qetlê vedimişt

Aşiqan bi temennayê şehadet can bire pêş
Ellah Ellah çi xerezdar e ku yek ferd nekuşt

Muhebetullah cemala me dikir çîne tewwaf
Xeyberî hatîne min xal û xet û çenber û qişt

Îsmê esma' me ji ber kir û di mebistan sifat
Talibê zatî me lew min semirand baxê buhuşt

Îsmê kamil ez im bûyime mescûdê melek
Muddeî ku nebîtin secde bi minha serî xişt

Xanîya dê hebîtin bêhuneran laf û guzaf
Aferîn bo te ku ev şêwe ji bo kesê te nehişt

Ji derdê işqê bedhal im eceb ber bûye min narek
Were canan bibîn halim ne min dil ma ne dildarek

Ne dildar û ne min dil man ne alal û ne sorgul man
Ne reyhan û ne sunbul man di dil da min xalî xarek

Di dil da min xalî peykan were ser min bike îhsan
Li kûrahî reqîbê min bibîn xoş bû birîndarek

Vede destan hebîba min bike derman tebîba min
Birîna min bike derman bi destê mubarek

Birîndaran birîn xweş bûn reqîban her du rûreş bûn
Di baxê husnê gula geş bûn nekêşit bulbul azarek

Seher bulbul bi hawar e di dil da ew birîndar e
Gelo nalîn ji bo ar e ne gul man ne gulnarek

Nekêşit bulbul azarê li rexma muh(e)beta xarê
Li fesla mahê azarê nemînit qet li dil yarek

Li dil barê xeman yar e ne nîsan û ne azar e
Her we zanî bi hawar e di destî maye guftarek

Dila qet nîne mehbûbek ji te cuz'ek nebit lalî
Dilara mane meczûbek heye sirra te jê xalî

Eger sirra di qelban e eger nûra di wechan e
Bi min yek reng û yeksan e digel bi yek bûn li wî alî

Ji xeybê ew bi yek hatin hemî cot in ne tek hatin
Wekî çavêd belek hatin bi hev ket şahî yû talî

Eger husn e eger nûr e eger nêzîk eger dûr e
Birîna aşiqan kûr e ji sertîra Kurê Zalî

Ji sertîran mucewher bû çi awir bû çi xencer bû
Ji bo min ra muqedder bû dema pevkirine selsalî

Wekî selsal fexxar im, tijî nûr im tijî nar im
Di batin şubhê xundkar im, bi zahir ketime vî şalî

Gellek etles gellek dîba, gellek dîlber gellek zîba
Gellek sîm û gellek şîba me havêtin bi gernalî

Bi gernalî me havêtin hemî yek yek hilavêtin
Gelo kî bit ku navêtin hebîbeka çarde salî

Meger her min divê dîlber du sed ilman biket ezber
Ji xilxalan dibit ebter mela meqsûdê xilxalî

Mela meqsûdî min xalî ne mulk im menzîl û mal e
Ne ilmê qal e ew hale me hasil kir bi ebdalî

Me hasil kir bi xizanî bi muştaqî û heyranî
Wekî genca di wêranî me peyda kir bi remalî

Bi remalî me peyda kir dilê xemgîn me pê şa kir
Neqil xed me aza kir wekî pîra du sed salî

Di dest delalê da min dî rexê kaxezê Semerqendî
Xettê Kûfî nuqtê Hindî kitêba husnê eşkalî

Kitêba husnê dîlber bû, xetê ellahûekber bû
Melayî ew ji ezber bû, li textê dil dibit walî

Li textê qelbî sultan e, dilê wî erşê Rehman e
Wekî Xanî ne nadan e dizanit ew bi ehwalî

Ji ehwalî xeberdar e bi sûret şiklê dildar e
Di batin eynê dîdar e teala sanehul alî

Şîweê işwe û nazêd ku dildar dikin
Aşiqan bo çi gelo hinde qeder har dikin

Gul digel bulbulê xweş teb'e û xendan e welê
Bêwefayî û cefaya ku dikin xar dikin

Hûn mekin lewme ji sahib kereman çendîn û
Ku çiranê em û ew bê zere û bê zar dikin

Wan divê hemî kes zêde ji wan razî bin
Li rozê tebasê hindekan sar dikin

Dîlberan ger neviya aşiq û şeyda pirr bin
Bo çira zînnet û xeml li xwe ew bar dikin

Rûhî aşiq rûyê me'şûq bi ser mutehid in
Mute'edded erd cewher înkarî dikin

Îzzet û rûmmet û dan cumle ji bal ya xweyî ne
Da bizanî tu ku ne şah û ne xundkar dikin

Wacib û lazim e daîm li me ketma emelê
Arif û aqil û dana ji xwe înkar dikin

Ne wekî Xanîyê nadan negihîştîyê avê
Batin her dîn ya di dil îzhar dikin

Xanî ..... (bi Tirkî ye)

Ey gulên perwerdeê gulzarê terawet
Wê serwîqedên sebzeê bustanê terawet
Wechin bekadur mînber û mîhrabî îbadet
Zulfun xemî serhelqeî zebnnar hîdayet
Însanî degildir bû tesewwur bû şerafet
Peh peh bû ne şekil û ne şemail ne qiyafet

Gulzarê Îremdur cennetî husnî cemalîn
Cennet baxîdir aşiqî bustanî wîsalin
Sewdazede melalî butun fikrîyle xeyalîn
Enfusê mesîha gîbîdîr feyzî mealîn
Aşîfteê te'wîz cunûndur xet û xeyalîn
Peh peh bû ne şekil û ne şemail ne qiyafet

Hîcran île can û dil derd û beladur
Xakî qodeman g–zlerîn mekhelê celadur
Lutf eyle ezîzim başun îçun bû ne înaddur
Sayin başime sal beka zelîl humadur
Bîllah yuzun ayîneê nûrê Xudadur
Peh peh bû ne şekil û ne şemail ne qiyafet

Ey xemzesî qanlî tokçî leblerî xunxar
Rî kibir kî merdim yeqçî g–zlerî xumar
Rahm eyle eya padîşahim kîm bu dilzar
çahî Zeqenînde nîcedîr –yle girîftar
Husnun k–r delî can û dil eyledîm îse
Peh peh bû ne şekil û ne şemail û ne qiyafet